

## Pirsa Kurd Pirsgirêka Herî Giring Ya Turkiyê...

Azad Kurdî

Ev sernivîs gotina çend rojan berî niha a Serok Komarê Tirkîyê, Ebdulah Gul li bajarê Bedlîs a Bakurê Kurdistanê ye. Daxuyanî û hewl û xebatên yek du hefteyên borî ên karbidestên payebilind yê Tirkîyê li ser giringiya Pirs Kurd û çareseriyên wê dozê ji rêya aşîxwazane û demokratîk ve, ev pirs di 20-30 salên borî de ji her dememkê zêdetir xist rojeva siyasî a Turkiyê. Demekî dirêj bû Erdogan daxwaza DTPê bo hevdîtin û civînan qebûl nedikir, lê serdan û hevdîtina roja 5ê Tebaxa 2009an a Serok Wezîrê Tirkîyê, Receb Teyib Erdoxan ligel Hevserokên Partiya Civaka Demokratîk (DTP) Ehmed Turk û Emîne Ayna dawî bi wê kirîzê û pirsgirêkan anî û hêviyekî nû da pêvajoya çareseriyê siyasîyane a wê pirs girîng û hestiyar a Komara Turkiyê ku zêdeyî 80 sal dibe pê re dinale . 1 avdêrên siyasî û siyasetvanên Kurd û Turk gavên vê dawiyê ên karbidestên Hikûmeta Dad û Pêşdeçûnê (AKP) û civîna Erdoxan û anda DTPê û herwiha daxuyanî û helwêstên Serok Komar û çend wezîrên dewletê derbarê çareserkirina aşîyane û demokratîk a Pirs Kurd li Turkiyê wek guhertineke kûr û mezin di proseya çareseriyê pirsgirêkên navxwe ên wî welatî dizanin û herdu aliyên hikûmet û DTPê jî pêvajoya nû û helwêst û gavên dewleta Turkiyê li dor vê pirs girîng a Turkiyê biwêrane, erênî û cihê hêviyê nixandî û vekirina deriyekî nû bi rûyê çareseriyê Pirs Kurd hesabandin.

Lê ji aliyekî din jî ev daxuyanî û hewl û civînan navbera du aliyan, bi dijberî û helwêstên tund ên her du partiyên mezin ên opozîsyona hikûmetê re, anku Partiya Komarîxwaz a Gel (CHP) û Partiya Neteweperest a Gel (MHP) rûbirû bû û wek ivîna AKPê û PKKê û wd... binav kirin.

Helwêsta van du partiyan zêde di çarçoveya lojîkek îkestxwarî û nejadperestane tê berçav ku di yek du dehsalên borî de li hember Pirs Kurd ji aliyê wan dihat meandî, ne rexneyekî pêgîrane li hember proseya çareseriyê an dijberiyek siyasî û mantiqî a partiyek opozîsyonê. Ji ber ku di dewrana desthilatdariya wan û partiyên din de, pirsgirêkên navxwe ên Turkiyê gelek kûrtir bûn û nerîn û ramana înkarkirina pirs Kurd û nasnameya netewî a

neteweyek zêdeyî 25 milyon nifûs li Turkiyê û herwiha domandina şer bi tevgera mafxwazane a Kurdistanê re di wî parçeyî de bû, niha ku Hikûmeta AKPê di dema van çend salên borî de hin gav û projeyên herçiqas biçûk bin

jî, bo çareserkirina Doza Kurd avêtine û dixwaze çareseriyekî kûrtir jê re peyda bike û lojîkî bi pirsê re tevbigere û pirsê bi rêya aşîxwazane û demokratîk û gotûbêjan ve çareser bike, ew du hêz wek berê ketine helwêstgirtina nejadperestane û dixwazin mezintirîn pirsgirêka navxwe ya Turkiyê ku Pirs Kurd û bînpêkirina mafê mirovan e, bê çareserî bimîne. Bêguman ev nerîn û gavên ku niha AKPê davêje û tîne rojevê, ger di dema du dehsalên borî de hatiban kirin, Turkiyê di asta navnetewî de rol û rewşekî cuda ji ya niha dibû. Bi taybet ji bo endambûna Turkiyê di Yekîtiya Ewropayê de. Dibe helwêst û daxuyaniya herî giring a Serok Komarê Turkiyê Ebdula Gul li bajarê Bedlîsê be ku li ser pirsê wiha axivî: "Pirs Kurd, pirs herî giring a Turkiyê ye û pêwîst e ew pirs bi şewazekî siyasîyane û demokratîk bê çareserkirin, ji ber ku ew doza hemû Turkiyê ye û divê Turkiyê wek welatekî modern û nûjen wê pirs girîng a xwe ya navxweyî çareser bike û pêngavan jê re bavêje.

Ketine rojeva Pirs Kurd li Turkiyê vedigere bo destpêkên dehsala 90 a Zayînî a sedsala borî ku bo yekemîn car jî dîrokzan û ronakbîrê navdar Dr. İsmail Beşikçi di teza xwe ya dukturayê de bi awayekî akademîk û realîte Doza Kurd xiste rojeva siyasî a Turkiyê û li ser wê pirsê çend caran cezayên giran ên girtîgehê ji Beşikçi re hat birrîn. Piştê di sala 1993an de, Serok Komarê wê demê yê Turkiyê ku xwe Kurd dizanî, rastiya hebûna Pirs Kurd anî rojevê. Lê heta çend salan berî niha jî baskirin ji wê mijarê hêla sor û xeter a Turkiyê dihat hesabandin. Bi taybet ji bo Ardeş, partiyên nejadperest û nasyonalîst ên Turk. Lê gavên van çend salên borî ên Hikûmeta AKPê guhertinek mezin li civaka Turkiyê û di nav rewşenbîr, siyasetvan û medyayan de pêk aniye û fezayekî erênî çêkirîye.

Nemaze vekirina Kanala TRT6ê D . R ( 11 )

